



Peşêw: 'Pereyên ku hikumet li Başûr dide nivîskaran heram e!'

Dîrok: 15.12.2006 Saet: 15:35

Mijar: Serbest

Davut OZALP

Wekî tê zanîn îsal yek ji mêvanên girîng ê Rojên Wêjeyê li Amedê Abdulla Peşêw bû. Piştî ku min ew li Amedê dît û me hinek sohbet kir, ez gelek kêfxweş û serbilind bûm. Asta wî ya entelektuelî ya kûr, nefsbîçûkî û mutewazîbûna wî, nîrxandin û şîroveyên wî yên der barê wêje, jîyan, Amed û pêşketinên li Başûr de bandoreke mezin li min kir.

Loma jî heta ku ji min hat min gotinên wî qeyd kirin.

Bêyî ku ez dirêj bikim, niha ez dixwazim hin gotinên Peşêw ên der barê mijarên cur bi cur de bi we re par ve bikim.

DER BARÊ WÊJEYÊ DE:

- * Şîr zimanê wijdanê ye; zimanê wijdanê jî zimanê dayikê ye...
- * Bila her kes binivîse, tu zirara wê nîn e. Li Rusya di zemanê Puşkîn de 10 hezar kesî helbest dinivîsî, lê niha tenê ji wan 10 kes mane... Dema min û Şêrko (Bêkes) me li Başûr dest bi nivîsîna helbest kiribû, gelek kesên din jî helbest dinivîsandin. Lê niha em çend kes mane? (Li hemberî pirsek wekî li vir pir pirtûkên ji rêzê û bê kalîte dertên ev yek anî ziman)
- * Divê şairên kurd ên ciwan, klasîkên kurdî baş fêhm bikin. Ew çavkaniyên esfî ne. Di nava folklorê de enerjîyeke mezin heye...

* Şairên ciwan bêhtir helbestên teze dixwînin û wisa dest bi nivîsînê dikin, loma jî helbesteke wisa çêdikin, helbesta wan nayê fêmkirin...

* Şîr girêdayî umr û tecrûbeyê ye. Di sala 1967'an de dîwana min a yekem derket.

Niha lê mêze dikim, ez fedî dikim...

* Berî ku ez şîrekê binivîsim hizrek min heye, dûre bi şîr wêneyek çêdikim...


* Çavkaniya min ya sereke folklor e, klasîkên kurdî û helbesta modern e...

DER BARÊ AMEDÊ DE:

* Li Amedê rih kurdî ye, lê ziman tirkî ye...

Tirkî di mejîyan de hatiye qebûlkin...

* (Ji rêveberê kurd re digot) Ji ber ku li vir kurdan di mejîyê xwe de tirkî qebûl kiriye loma dewlet dev ji we bernade, dozan li we vedike. Ji ber ku di rewşek wiha de, hûn dixwazin cardin kurdî ji nû



ve vejînin (ji nebûnê zimanekî çê dikin) ev jî dibe cihêxwazî... Heke kurdî di jiyane de serdest bûya dewletê dê zûtir hêviyên xwe ji we (kurdan) bibiriya û dev ji we berda...

DER BARÊ BAŞÛR DE:

- * Li Başûr 10 mîlyon dolar ji bo lê lê û lo lo tê xerckirin, lê ji bo kurdî tiştek nayê kirin.
- * Bi navê projeyan pereyan distînin. Yek tê dibêje, 'Em mihrîcanekî çêbikin, ewqas pere.' De haydê, ji derve bi dehan mêvanan tînin û li hotelan bi cih dikin, her şevê nizanîm çiqas dolar diçe ji xwediyên otelan re... Wan projeyan mala me xera kiriye...
- * Pereyên ku hikumet li Başûr dide nivîskaran rişwet e, loma jî heram e. Heqê sêwî û hejaran e.
- * Bi pereyê ku didin nivîskaran wan dikirin. Li Başûr rewşenbîrekî ku rabe hikumetê rexne bike nemaye.
- * Dewlet bi qanûn û nîzamê dibe dewlet. Lê li Başûr tu qanûn nîn e. Em dibêjin qanûnekî çêbikin rê li ber korsanê bigirin lê çênakin. Qanûnê çê nakin mafên me neparêzin, lê pereyan didin me!
- * Rêveberekî bangî min kir got, 'Were ji te re ew qas dolar alîkarî.' Min got, 'Na, ez nagirim. Ew rişwet e. Madem ku hûn pereyan didin, bi vî pereyî saziyekê vekin, ez jî werim li vir wekî karmendekî rojê 16 saet kar bikim. Em bi vî pereyî ferhenga kurdî çêkin. Em ansîklopediya Kurdistanê çêkin.' Got, 'erê erê' lê çend sal li ser borîn hê jî li min negeriya ye.
- * Hikumet li Başûr ji bo bi pêşxistina cotkarî û çandiniyê ku çavkaniya herî bingehîn a gundiyên kurd e tu tiştekî nake. Dolaran li gel belav dike. Çandinî û cotkarî miriye. Însanên me wê taybetiya xwe wînda dikin. Tu hilberîn nîn e. Ma wiha dewletbûn dibe.
- * Du sal berê serokekî kurd xwest ku ez biçim pêre xwarinekê bixwim. Ez neçûm. Heke ez biçûma roja duyem min ê nekariba ew rexne bikira... Desthilatî kirêt e. Gerek mirov xwe jê dûr bigire.
- * Li Başûr, li aliyekî hejar û belengaz, li aliyekî mîlyoner... Ez tu demê nebûme komînist, lê min bidîta yek partiya komînist ez ê bibûma endam. (Behsa gera xwe ya li Başûr dikir)

davutozalp@yahoo.com

Diyarname.com

Cihê ev nûçe jê hatiye: [celadet.com](http://www.celadet.com)

<http://www.celadet.com/ym/>

Ji bo vê nûçeyê navnîşan:

<http://www.celadet.com/ym/modules.php?name=News&file=article&sid=183>